


# ROJANÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



1985  
7

## NAVEROK

Nameyên Xwendevanan .....	4
Cigerxwin-Jiyinike B1 Rûmet .....	5
J1 Albûma Cigerxwin .....	8
Cigerxwin-Ew Helbastvanê Gel Bû .....	9
Nameyek J1 Prf.Qanatê Kurdo .....	11
Mesajên Serxweşiyê .....	12
Me Yılmaz Guney Winda kîr .....	16
Hevpeyvin B1 Lazerev Ra .....	19
Evina Dîlê Mîn .....	22
Ordixanê Celil Kiye? .....	23
Du Diplom .....	26
Zarokxana Kurdi .....	27
Brecht .....	28
J1 Nav Weşanan .....	30

مه و نامه‌ی کتیب

SAL : 7  
HEJMAR : 50

Xwedi : KOMKAR-Swêd  
Berpîrsiyar : Rohat  
Navnişan : Karlbergsv. 32B. nb  
113 27 Stockholm  
Telefon : 08-328251  
Hesap No : PG. 458980-0

Utgivare : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
Ansvarig Utgivare : Rohat  
Adress : Karlbergsv. 32B nb  
113 27 Stocholm  
PG. : 458980-0

## Saleke Reş û Rûsar

Jî bo gelê kurd, huner, edebiyat û çanda gelê me, sala 1984'an, bî rasti wek saleke reş derbaz bû. Sala 1984'an, mamoste, helbestvan û ronakbirê mezî Cigerxwin jî nav me hîlda bîr, dî vî wari da valahike mezî peyda bû, jî ber ku Cigerxwin sêtaç û rûmeta çand, huner û edebiyata me bû. Dî roja 22-10-1984'an da Cigerxwin çavên xwe da hev û jî nav me barkîr çû. Lê tîşteki dîn jî heye Cigerxwin pey xwe jî me ra definek hişt û efrandinên giranbuha hişt. Lî Swêdê bî hezaran kes hat, dî serxweşiya Cigerxwin da beşdar bû û hurmeta xwe lî ber Cigerxwin nişan dan. Bî sedan mesaj hatin şandin. Roja definkirina wî da lî Kurdîstana Sûriyê bî sed hezaran kes me şiya.

Dî sala 1984'an da rojêke reş disa lî serê gelê kurd peyda bû, filmçêkirê nav û deng, lawê kurd, xudanê xelata Festivala Cannesê, Yılmaz Guney jî yekten jî nav me barkîr, çû dîlovaniya xwe. Mîrîna wî, dî demên xwe yê ciwan da, yê jêhati da, bî rasti jî bo gelê kurd wundakîrîneke mezîne.

Kovara Roja Nû, jî ber mîrîna Cigerxwin û Yılmaz Guney gelek dîlêş û rûsare. Wundakîrîna du hosta û hunermendên çanda kurdi Roja Nû û xwendevanên wê gelek êşand. Name, mesaj û nivîsarên gihiştîna destê me, vê êşa me parevedikîn.

Kovara Roja Nû, dî vê hejmara xwe da, bî taybetî pîraniya rûpelên xwe, jî seydayê mezî Cigerxwin û Yılmaz Guney ra veqetand. Kovara me wundakîrîna wan herdu lawên kurd wek du bûyerên mezîna dibîne. Kovara Roja Nû, wê biranîna Cigerxwin û Yılmaz Guney hertîm bîde jiyandinê.

Redaksiyona Roja Nû

## 50 Hejmar û 7 Sal

Bî vê hejmarê va, heta niha 50 hejmarên ROJA NÛ çap bûn û ROJA NÛ kete 7 saliya xwe, çawa tê zanîn ROJA NÛ dî sala 1978'an da lî Swêdê despêkîr hat weşandin. Heta sala 1983 bî du zîmanan Kurdi û Tîrki derket. Paşê tenê zîmanê ROJA NÛ bû zîmanê kurdi. Jî aliyê dîn naveroka wê jî hat guhurandin, ew bû kovareke çandî, hunerî û edebî. Jî vîr şunda jî, kovara ROJA NÛ form û naveroka xwe bî vî tehri wê bîde berdewam kirin.

## J1 XWENDEVANAN

KANADA

Redaksiyona Roja Nû ra,  
Ew hevalên ku, kar û barên " Roja  
Nû" dane ser milên xwe, ez dîxwazim  
beri her tîştî wan pîroz bîkîm.

Hejmara dawî da, hinek gotinên  
Kurdi û hemberê wana Tırki hatibû  
nıvisandinê. Ev yeka jî bo hinbûna  
zımanê kurdi tîşteki gelek pêwîste.  
Ez dîxwazim vîr şunda jî ev yeka bê  
domandin.

Aliyê dîn da pêşniyareke mîn he-  
ye. Hûn bîkarîbîn kovarê da listeke  
navan (qiz û kur) jî bo me xwendeva-  
nan çap bîkîm, ezê gelek kêfxweşbîm.

Ez disa we bî dîl û can pîroz dî-  
kîm û serfîraziya we dîxwazim.

Ali Tamşen

ELMANYA FEDERAL

Hevalên hêja,

Ez xwendevanê kovara "ROJA NÛ"  
me. Şuxul û keftelefa ku hûn jî bo  
kovarê dîkîm eyane û pîr hêjaye. Ez  
geleki kêfxweş dibîm.

Ez karkerek jî Kurdîstana Tırki-  
yême. Jî bo xwendinê lî Nurnberg ba-  
jarê Elmanyayê dîmînim. Ez helbestek  
xwe, ku mîn lî ser faşîzmê nıvîsiye  
jî wera dîşînim.

Bî sîlavên şoreşgerî û bîrati.

Azad Fesih  
NURNBERG

MOSKO

Hevalên hêja,

Ez gelek sîlavên xwe yê germin û  
şoreşgerî jî wera û jî endamên "Ro-  
ja Nû" ra dîşînim.

Ez gelek kêfxweş dibîm gava ku  
ez "Roja Nû" dîbînim. Bî rasti kova-  
ra "Roja Nû" xebatek mezîn dîke, zı-  
man û kultura mîlletê kurdi dîde nas  
kırîm. Jî ber vê yekê ez dîxwazim,  
hûn jî me ra herdem bîşînin, jî ber  
ku pîr kêmtê Mosko.

Jî we ra pêşketin û serfîrazi,  
xweşî dîxwazim.

Bêkes Telo  
MOSKO

KURDISTAN


Hevalên hêja,

Xeber hate Kurdîstana Îran ku za-  
na û helbestvanê mezîn çûye rehmeti-  
ya xwe. Ez nîzanîm eva yeka raste yan  
derewe. Eger ev xebera rast be, ez bî  
dax û keserên dîlê xwe va tevayî ser  
xweşîya malbata wî dîkîm û dibîm se-  
rê we sax be.

Bî Slavên Germin  
A.Şerifi  
Mehabat.

---

# CİGERXWÎN Û JİYÎNEKE BÎ RÛMET



GUNDÎ

Roja 22-10-1984 seet 3.00 mamosteyê mezın Cegerxûn lı bajarê Stockholm (Swêd) çavên xwe girtın, can da û jiyana xwe ya 81 salı qedand...

Êdi binalın jı kûraniya dılan  
Co û cobarên Kurdistan  
Bıherkinın hêstıran  
Bax û bıstanên Kurdistan  
Bıkêşının keseran  
Law û keçên Kurdistan  
Gırêdın reşan  
Her çar perçên Kurdistan  
Hate xar...  
Hate xar jı ezmanê me kurdan  
Stêrka bıst milyonan  
Rêberê bındestan  
Lawê Kurdistan  
Qehremanê Kurdistan  
Cegerxûnê cegerxûnan.

x x x

Ax seydayê mezın  
Em difırıyan bı baskên te  
Em dıcıviyan lı siya te  
Em dılxaşdıbûn bı gotınên te  
Em serbılındıbûn bı navê te.

x x x

Seydayê mezın..  
Çıqas dıjware ev cıvına  
Bê hebûna te  
Çıqas dıjware ev kombûna me  
Lı dor mırına te.

Mırovên nola Cegerxûn, eger bı canê xwe dıçın, lê ew bı nav û dengê xwe dımının, herdem dımının, dıbın giyanê gelê xwe, giyanê tevaya mırovaniyê...

B1 evineka kûr Cegerxûn hate ber doza gelê xwe û bêtiri 60 sali b1 wa evina kûr d1 nav xebata gelê xwe da ma, dara azadiyê avda û hêviyên mezın çandın.

D1 60 sali da Cegerxûn her bûyereka mezın l1 Kurdîstanê, l1 Roj hılata Navin û l1 cihanê d1 nav helbestên xwe da bıcıhkiriye. B1 dılşewati, b1 dılteniki rewşa hejar û belengazan xıstiye ber çavan, eşkere xwe daye yalê wan.

Tu kesi j1 Cegerxûn baştir derd û nexaşıyên gelê kurd d1 sed-salê bistan da nasnekırine. Tu kesi j1 Cegerxûn j1 baştir ev derd û nexaşıyên me wusan zelal, wusan b1 zanin nişannedane, diyarnekirne.

D1 60 sali da Cegerxûn rêya serketinê, rêya serxwebûnê, rêya azadiyê dıde pêş gelê me. Tu caran Cegerxûn xwe j1 kar û xebatê neda aliki. B1 qelem û raman û b1 can û giyanê xwe hate ser rêya tekoşına gelê kurd û b1 baweriyeke kûr û b1 dengeki bılind bıryar da û got:

Sond û peyman bi l1 ser me  
Em j1 vê rê nagerin  
Canfidane em d1 vê rê  
Nayê bira me mırın.

Cegerxûn heta roja dawı, ta 81 sal jıyan l1 ser sond û peymanên xwe ma û xebata xwe berdewamkır.

L1 nav gelê xwe, l1 her çar perçên Kurdîstanê geriya û dit, tevgera siyasi da beşdar bû, çand û zımanê kurdi pêşva bır. Cegerxûn baş dızani, ku bê zanin, bê pêşketına zanisti rızgariya siyasi û civaki çênabın. B1 sedan car nıvisandiye û gotiye: "Bıxûnın, zanabın, hışyarbın, herne pêş." Bê hejmar deng lêkiriye l1 karkeran, l1 cotkaran, l1 xortan û keçan, l1 jin û mêran, l1 tevaya gel, ta ku rabın ser xwe, xudayên doza xwe bın, mılên xwe b1 mılên hev dın, b1 hevra bın, yekbın.

Cegerxûn tu caran serê xwe l1 ber dijmin danexist, netırsi. Cegerxûn baş dızani, ku serketına me ne tışteki asane. Baş dızani, ku rêya azadi û serxwebûna me gelek dirêje. Lê tu caran ew bê hêvi nema, dest j1 xaşbiniyê berneda. D1 demên dijwar da baştirin sırûd û helbestên niştımanperweri nıvisandine, dest daye ser birinên gelê xwe û dijmin riswakırine û meydana xebatê nişandaye.

Dema Cegerxûn destpêkır, ku ramanên pêşverû û zanisti l1 nav gel b1 gotın û nıvisandın belavke, olperest û kevneperestan êriş anine ser Cegerxûn. Hêzên wana d1 nav gel da hên gelek xurtbûn. Nezan û belengazan bıkorani dabûn pey axan û şêxan. J1 her ali da êrişi Cegerxûn dıkırın, navê wi pısdıkırın, jê ra dıgotın bê dın, kafır. Cegerxûn j1 nezan û kevneperestan ra b1 qehir, b1 hêrs dıgot:

Zana dızanın ew kiye  
Ên ker dıbêjin kafire.

Cegerxûn, wek miroveki hışyar û zana, rewşa tevaya cihanê dıda ber çavên xwe. Wi serketinên ramanên azadiyê l1 cihanê dıdıtın û dıxast wan ramanan l1 nav gelê xwe da belavke. Cegerxûn dızani, ku ev ne tıştê nûhın, lê ew bo gelê kurd hên tezebûn:

Gotınên ku em dıbêjin her kesi hışyar dıkın  
Ne gelek nû ne welakin nû gıhiştın van dera.

Cegerxûn zû têgıhişt, ku doza gelê kurd j1 rewşa Rojhılata Navin nayê birin, ku Kurdistan bıxwe j1 meydaneke j1 meydanên navbera koledar û azadixwazan, lewra Cegerxûn b1 hêz b1 xurti piştgiriya tev

gerên azadixaz kır. Helbestên wi yên navnetewi rûyê tevgera kurdî nişandidan.

Gelek karvan jî welatparêzên kurd bî helbestên Cegerxûn doza netewî û ya navnetewî naskirin, têgihîştin, ku serketina geleki lî cihanê serketine bo gelê me jî. Dî vîr da jî em nîmûneyekê jî helbestên Cegerxûn tinin. Dema şoreşgerên Vîyetnamê bî qehremanî erîş bîrîn ser leşkerê kolonyalistên Fîransî û kela (Dîyan Biyan Fû) rîz garkirin, Cegerxûn bî dîlşadi û serfirazi nivîsand û got:

Dîyan-bîyan-fû, dîyan-bîyan-fû !  
Lîngê koledar jî ser te rabû.  
Kurên te gernas xwe dane kuştin  
Navek pîr bîlînd jî bo te hîştin.

Her wusan Cegerxûn bo hemû gelan ala azadiyê bîlîndkiriye û bê rawestan eniya xwe daye dijminên gelan û berberiya wan kiriye. Lê eger dengê Cegerxûn tenê dî nav gelê me da hatiye bîhistin, eger tenê welatparêzên kurd bî helbestên Cegerxûn perwerdebûne û eger tekoşerên cihanê navê Cegerxûn nebîhistine, ev tenê jî ber ku wela tê me bîndeste, perçe perçeye, bê ale, bê denge, jî ber ku karvanên me negihîştine armancên mezin, diwarên reş hilneweşandine, kember û zîncîrên nijadperestan neçîrandine, jî ber ku welatparêzên me mîlên xwe nedane mîlên hev, nexşa Rojhîlata Navîn serrastnekirine, serxwebûna xwe nestandine, devleta xwe avanekirine, jî ber ku heta îro em nebûne yek lî ser rêya Cegerxûn. Lewra Cegerxûn lî cihanê ne hatiye naskirin, dengê wi nehatiye bîhistin.

Em zanin sibê lî bajarên Kurdîstana rîzgarkirî navê Cegerxûn wê lî kolan û meydanan be, heykelên Cegerxûn wê lî pîr deran bîn. Helbestên Cegerxûn wê werin xwendin dî xwendegêh û zanîngehan da. Zaroyên Kurdîstan wê sîrûdên Cegerxûn bîkî stranên cejn û şahîyan.

Em zanin, ku dema me wê bî navê dema Cegerxûn têkeve dîroka Kurdîstanê û newiyên me yên diwaroj wê me bî newiyên Cegerxûn bînasîn.

Lewra em serbîlîndin, em serfirazin bî Cegerxûn, em bawerîn bî rastiya rêya Cegerxûn, em bextewarîn bî dema Cegerxûn.



Şîna Cigerxwin Lî Kurdîstana Suriyê - 1984



1937



CIGERXWIN TEVI KURDNASÊN LENINGRADÊ



CIGERXWIN Û JINA WI


Ji Albūma

# CIGERXWIN

کتابخانه



BI HUNERMENDÊN TIRK MELIKE DEMIRAG Û ŞENER YURDATAPAN RA



CIGERXWIN LI KURDISTANA IRAQÊ-1969



CIGERXWIN LI ELMANYAYÊ DI SEVEKE NEWROZÊ DA



# CIGERXWIN

## Ew Helbestvanê Gel Bû

A. BALÎ

Hozan û şairê mezîn bî nav û deng Cigerxwin roja 22'ê Çiriya Pêşin lî Swêdê bajarê Stockholmê çû ser heqîya xwe.

Weki çawa helbesteki xwe da ji nivîsiye û gotiye:

"Sala hezar û nehsed û sê ez hatim dinyayê ,  
Bî navê Siltan Şêxmûs ez çêbûme jî dayê."

Cigerxwin bî gotinên xwe, dî sala 1983'an lî navça Mêrdînê lî gundê Hesarê hatiye dinê, bî navê Şêxmûs Hesên. Hîn zarok bû bavê xwe, salek şûnda jî dayka xwe wînda dîke û sêwi dimine. Rêçberiya dewlemend û axan dîke, dibe şivan û gavan. Dî zarokatiya xwe da zorkari û sîtema beg û axan dibîne û pê dihese. Yek caran jî ber pez û naxirê beg û axan direve bî hevalên xwe yê diçûn xwendegehê va xwendin û nivîsandinê hîn dibe.

Dî cuwaniya xwe da hemû Kurdistanê digere û dibîne. Çanda kurdan û jiyana wan ya bîndest nas dîke. Rewşa gelê kurd teda, belengazi û perişaniya wî hemû dîkeve dilê Şêxmûs. Dilê Şêxmûs jî dest axa begên kurd û neyaran diperte, dibe xwin. Ew êdî dibe Cigerxwin. Bî gotina xwe:

"Beri sala rehmeti bî çar salên dilbîrin,  
Dî şî'rê da navê xwe mî datani Cigerxwin."

Dî xortiya xwe da Cigerxwin, axa û begên kurdan yê kedxur, zordar û girêdayina wan bî dujmanan ra çêkiri, baş nas kîr. Lî dîji wana şer kîr, qet tu caran hustiyê xwe lî ber wan xwar nekîr.

Cigerxwin lî saliya xwe da dest bî xwendina olî (dîni) kîr, deh salan şûnda dibe meleyê mîzgeftê. Dî sala 1927'an da dîzewice. Dî wê salê da dî nav himdarên rêxistina Kurdistanê Xoybûn da cih digire. Bî Bedîrxanan ra kovara Hawar derdixî.

Seyda Cigerxwin dibêje ku "mî 1924'an da dest bî nivîsandina helbestan kîr. Ew sala bû destpêka sala mî ya niştîmanperwer. Lî pêş vê salê helbestên mî nivîsandi da girani lî ser xwestekên netewî û niştîmanperwerî bû." Lê rasti, ew helbestana disa lî dîji axa, beg, şêx û hemû kevneperestanin. Ew şeklê nivîsandinê heya şerê cihanê duwemin dom dîke. Dî salên 1945-1946'an da Seyda bî gotina xwe "Dî van salan da dî helbestên mî da girani derbazi ramana şoreşgerî û çinayeti (sînîfi) bû." dibêje. Niştîmanperweriya Cigerxwin dî nav karker û cotkarên kurd gelekî belav bû. Xwesteka seyda Cigerxwin herî dawî jî bo azadiya kurdan ew bû ku hemû kurdên niştîmanperwer û dilsoz destên xwe bîdî hev, bî refûref lî dîji dujmanan şer bîkî û zîncirên koledariyê û imperyalizmê bîşkênî. Jî bo vê armancê kar kîr, şer kîr, mîrov hîşyar kîrî bî hezaran. Dî vê xebata şoreşgerî da piştgirên wî pîr bûn. Ew dî nav tevgera Kurdistanê ya azadîxwaz da şervaneki hemû Kurdistanê ye. Ew dî nav kurdan da himdarê biratiya gelan e. Hozanê hemû Kurdistanê ye. Ew dostê gelên bîndest lî cihanê ye. Ew dî nav şerê Vietnamê

da ye. Ew lı Qorê dıji imperyalistan bı helbestên xwe şer dıke. Ew dujminê imperyalizmê, koledari, kedxuri û faşizmê bû. Ew dengbêjê azadi û aşitiyê bû. Jı bo aşitiyê helbestê bı navê "Keçên Demokrat" da gazi dıke:

"Keçên demokrat bıkın qır û deng,  
Em nan dıxwazın, naxwazın tıfeng,  
Aşiti dıxwazın, em naxwazın ceng."

Dı sala 1951'an da Mihricana (festivala) lı Berlina Rojhilat pêk hati da dıxwest ku amade bıbe. Jı bo ku pasport negirt, nıkarı-bû bıçe. Lê ew helbestê jı bo Mihricanê nivisandi da mirov baş dı-bine ku Seyda helbestvaneki internasyonale.

"Herın mihrican, mihricana xweş,  
Destê hev bıgırın ciwan, Çini, Ereb û Hebeş,  
Hemı bıbın yek çı gewr û çı reş."

Dı sala 1958'an Cigerxwin dıçe Bexdadê. Lı wır sê salan lı za-ningehê jı bo xort û keçên kurdan ders dıde. Dı wê demê da "Destûra Zımanê Kurdi" dınivisine û çap dıke. Disa lı Bexdadê dest bı nıvi-sandına "Fehenga Kurdi" dıke û bı tipên A, B, C banda yekemın 320 rûpel dıde çapkırınê. Dı sala 1947'an "Cim û Gulperi" û dı sala 1956'an da "Reşoyê Darê" çap dıke. Herdu pirtûk ji pirtûkên çiro-kanın. Dı sala 1945'an heya iro heft diwanên wi yên helbestan ha-tın çapkırın. Navê diwanên wi diwana yekan 1945, Sewra Azadi 1954, Kime Ez 1973, Ronak 1980, Zend-Awısta 1981, Şefaq 1982, Hêvi 1983.

Karûbarên seyda Cigerxwin bı van pirtûkan nayê diyarkırın. Tış-tên wi nivisandına weki xweşiya xwe da ji diyarkırı bû qasi çıl (40) pirtûk jê derkevın. Pêwıste ewana gelek baş bêne komkırın û bên weşandın. Mırovên wek seyda dı nav gelan da hındık têne dınê. Pêwıste em qıymeta seyda bızanıbın û lı dınê bıdine naskırın.

Seyda Cigerxwin ne tenê helbestvan bû, Ew dirokzan, zımanzan, ew mıroveki heralı bû, bê guman wek deryakê bû. Seyda feylesofeki Kur-distanê bû. Karûbarên wi yên heyi û hın yên çap nebûyın roj bı roj wê derkevın ronahiyê, qıymeta seyda hın ji bılınd be, ewê jı bo ge-lê me wek stêrka sor lı ezman her dem bıçıruse û wê ronahiyê be-lav bıke.

Seyda gelek dıxwest ku Kurdistaneke azad û sosyalist bıbine. Xwesteka seyda dawı ew bû. Ew roja jı feleka xayın lê pır dit. Sey-da, ew roja şahı û aza nedit. Lê, em bawerın ew roja ne dûre. Jı bo ku Cigerxwin namıre. Ji yın û tekoşına gel da her dem hazıre. Seyda-yê mezın her û her wê bıji dı diroka Kurdistanê da.

**NAMEK JI  
MAMOSTEYÊ MEZIN  
Prof. QANATÊ KURDO**



Geli heval û hevkarên delal, xûşk û birayên êziz!

Sala 1984 rojên reş lî ser rewşenbir û şerkerên azadkırına neteweyê me da anin, du mêrên mezin, navdar û pêşkevti jî nav me bî rine rehmetê. Herdu mêr yek Yılmaz Guney bû, yê dîn Cegerxûn bû. Reş girêdan, şin û girin kırın bo me bêfeydedanin. Girinên me wana venagerinin, Lê iş û karê wan, bir û bawara wane pêşkevti wê lî dîl û hişê meda biminin, heta hetayê jî mera bîbine çek û sila hên şerê serxwebûna kurdan, nav û dengê wan wê heta hetayê bîminin.

İş û karê Cegerxûnê şerbêj û helbestvanê meyi eziz, heval û hevkarê minî herî nêzik jî zûva bî minva aşkera û eyan bûn, ew şerê serê çiyayên Kurdistanê bû, sertacê helbestvanê kurdan bû, ew jî neteweyê kurdra Sterka Gulgeş bû. Sterka nişankırına riya pêşveçûn û gulgeşbûna helbestvaniya kurdan bû, steyrka nişankırına riya azadkırına kurd û Kurdistanê bû, ala aşiti, dosti, hevkarî û wekheviya neteweyên Rohilata Nêzik bû. İş û karên wî, efırandın û bir û bawera wî dê paşwextiyê da dî şerê tevgera kurdanda wê heta hetayê usan biminin, jî xort û keçên kurdara bîbine nîmûnê qehremani yê şerên serxwebûna kurd û Kurdistanê.

Bıla sax bın heval û hevkarên Cegerxûn, bila dax bın mêrên dorberên wî, bila destê xwe lî ber xweda da nexın, dest bîdın destê hev, piştgirê hev bın, rêz û komên xwe bıkın yek, dî riya wîda herın, bî serfırazi bıgıhıjne meremê xwe.

Bıla heval û hevkarên me delal jî bir nekın, ku neteweyê kurd netewekî mezine, xelqê kurd namire, wê jî nav wî gelek mêrên mina Yılmaz Guney û Cegerxûn jî nav palên çiyayên Kurdistanê rabın, ala azadkırına kurdan bîdine ser mîlên xwe, neteweyê xwe ber bî serxwebûnê bîbin.

Dî nıvisarên rewşenbirên kurdanda, dî nıvisarên zanyarên Evropayêda û Sovyetistanêda gelek caran gotınên layq û hêja lî ser iş û karên Cegerxûn û efırandınên wî hatine nıvisandınê, qedır û kıymetê wan baştırın hatiye nişankırınê. Şeer û helbest û nıvisarên Cegerxûn zanyari wê sal û zamanan bîbine kaniya lêgerina jiyin û ayina kurdan, bîbine kaniya lêgerina bir û baweriya kurdeweriyê. Nav û dengê wî, wê lî dîl û hınavê komên şerkarên kurdanda, lî hişê rewşenbir û zanyarên kurdanda heta hetayê biminin, em qet caran jî bir nakın. İş û karên wî, nıvisarên wî, wê jî peyrevên wira biminin wek şiret û nesihetên pêşveçûn û serketına neteweyê kurd.

Qanatê Kurdo  
Lêningrad, 24-10-1984

# MESAJÊN SERXWEŞIYÊ

Pışti mırına Cigerxwin sedi zêdetir mesaj, sılavname û nameyên serxweşiyê lı ser navê malbata wi hatin şandin. Wısan ji bı hezaran kes dı şina wi da beşdar bûn. Em lı jêr, jı van mesajan çend heban pêşkêşî xwendevanan dıkn.

REDAKSİYONA ROJA NÛ

Dengê karker û xebatkarên Kurdistan û cihanê, hozanê aşitixwaz û dilgerm, tekoşerê bê westan Cigerxwin, iro êdi ne dı nav me da ye.

Dileki, diji zılmê û zordestiyê bo azadi û aşitiyê dı heyştê sa liya xwe da lêdixıst, 22'yê Oktobrêda sekini. Lê dengê helbestê hozanê mezın, vır şunda ji, dilê gelê bindest û xebatkar da êdi xurtir wê deng bide.

Navê Cigerxwin lı dervayi welat bo miletê kurd bûye serfirazi û serbilindi. Dengê Cigerxwin, diji hemû zordesti û zilma dijmin wek birûskeke tari qelişand û xwe gihande karker û xebatkarên Cihanê.

Îro, Cigerxwin wek Neruda, Brecht, Mayakovski, Aragon û Nazım Hikmet nehatibe naskirinê ji, rojên bên ku helbestê wi, wê lı ser zımanê xebatkarên dinê bıbin slogan û diji dijmin wê bıbin çekeke bê hempa.

Angori şert û mercên Kurdistanê, disa ji navê Cigerxwin, xwe gihandiye gelê cihanê.

Koka helbestên Cigerxwin, bın axa Kurdistanê dane. Lê mıl-çiqalê wan ser hemû axa cihanêda bilind bûne û dıbin. Rojekê ber derê Berlinê diji Naziyê xwinxwar bal ordiya sore, rojekê Diyan-Biyan-Fu ye diji emperyalista lı ba gelê Vietnam qehremane, rojekê diji nijadperesta lı bal Heval Robsone.

Bo vê yekê ji navê Cigerxwin nav şairên enternasyonalist da tê jimartin. Dilê hozanê mezın ne tenê bo gelê Kurdistanê bindest, wusan ji, bo hemû karker û xebatkarên dinê û miletê bindest dışewıte. Ev yeka bo gelê kurd bûye serfirazike mezın.

Hozanê mezın, helbest û karê çandi da rêçeke giranbuha vekiriye. Ew, ne tenê helbestnivisare, wusan ji, ser zıman û diroka Kurdistanê da ji, xwe westandiye. Efrandinê wi bo hişyarbûnê, ronakbûnê û bo serhildanê defineke.

Bı kurtayi, iro mırına şairê azadixwazê neteweyê kurd, şerkarê a şitiya dinyayê û dostê gelê cihanê Cigerxwin, bo me valahike mezın û xemeke giran hişt.

Lê, em efrandinê wi û navê wi tu car, tu west bir nakın, ew dilê me da agıreke û venamıre.

KOVARA ROJA NÛ

Ziyaneke gelek mezın lı gelê kurd ket, ez êşa ku hûn dıqşının bı we ra pare vedıkım. Ez baş dızanım, Cigerxwin jı bo gelê kurd gelek hêja bû. Cigerxwin, jı bo kombûna gelê kurd û jı bo kultura gelê kurd bûbû keseki bêhempa. Dema Cigerxwin dı sala 1979' an da hate Swêdê, helbestên wi jı hatın gıhiştın me Swêdiyan. Çar berevokên helbestên wi lı vır çûne der û mın bı xwe jı helbestên wi guh dar kırın. Ez jı helbestên wi dı dilê xwe da vedişêrım. Cigerxwin dı nav me da nine, lê helbestên wi ramanên wi û xurtbûna wi dıji. Dı nav kurdên Tırkiyê, Irak, İran û Suriyê da helbestên wi lı ser têlên tembûrên dengbêjan dıgerın. Çawa lı bal we, wusan jı, lı bal me helbestên wi, efrandinên wi, wê hertım zendı bımının. Wı, hun jı û em Swêdi jı dewlemend kır.

Wezirê Mihacıran  
ANİTA GRADİN

Xuşk bırayên eziz, jı ber mırına stêrka rênişa serxwebûna kurdan Cigerxwinê mezın, mın tevi we reş girêdaye. Efrandinên Cigerxwin heta hetayê wê dı nav xort keçên kurdan bıbine nımûnên şerê qehremaniyê, wê bıbın şiret nesihetên serketına neteweyê gelê kurd.

Qanadê KURDO

Kurdnasên bajarê Leningradê tevi we şahra reş girêdaye. Nav û dengê wi, hertım wê dilê me da bımıne.

KOMA KURDNASÊN  
LENİNGRADÊ

Bı dileki keser em şına we parva dıkın.

Komela Niviskarên Swêd

Cigerxwin dı şeverêşa Kurdistanê da tirêjeke ronahiyê, dengê azadiyê bû. Ew dı diroka rızgariya gelê kurd da xwediyê ciheki mezın û domdare. Mırına wi, hevalê me yê eziz, em hemû gelek xemgin kır. Bı la hun sax bın, gelê sax be.

ENSTİTUYA KURDİ

Jı ber mırına Cigerxwin ez gelek ber xwe ketım, bıla serê we, za rokên we û serê gelê kurd sax be.

Pireka Yılmaz Guney  
FATOŞ GUNEY

Mırına helbestvanê bırayê gelê kurd Cigerxwin me bı xemgini bıhist. Em jı we ra jı hemû gelê kurd ra serxweşiyê dıxwazın. Dı riya Cigerxwin da gelek keç û xortên kurd wê bımeşın, jı ber vê yekê em xwe teselli dıkın.

Melike û Şener Yurdatapan

Sılaveki dawiyê jı bo seydayê mezın Cigerxwin.

Şıvan û Gulistan

Birayên Mîn!

Bersiveke nebixêriyê jî mera hat. Apê mîn Cegerxwin, ez korbim bona te, bona mêrê çê.

Ev bû du sehet, mîn qelem hildaye destê xwe, dixwazim gotîna xwe li serxweşiyê bî dileki kovan û xemgin wera binivisim ser mesela mîrîna Cegerxwinê mezîn, lê qelema mîn nagere, destê mîn naçê, ku ez ser vê meselê wera binivisim. Vê demê, ku ez jî wera dinivisim, li mala xwedame, nava zarokan da, lê der-dorê mîn valeye, xalî bûye, her tenê dengê Cegerxwin di guhê mindane. (mîn sala 1982'an da li bajarê Leningradê hevpeyvîneke bî 75 deqe bî wi ra çê kir û niha guhdar dikim), suret û demê wi ber çavê mine (me ew wêne dema hevdîtina me tevayî kîşand), nema wî ya bona mîrîna bavê mîn ser textê minî nivîsarêye ewî bî destê xweyî nazîk, bî destên helbestnivîs xeberên serxweşiyê derheqa bavê mînda nivîsibû.

Cihan iro bona mîn teng bûye, bûye dojeh. Mîrîna te wek mîrîna bavê mîn ez hingavtîm.

Mîn jî wek hemû kurda navê te bihistibû, helbest û nivîştên te xwendibûn, ezber kiribûn, lê xwezîl mîn bî çevên ne dita, ku iro tengezar, reben û bêçare ne mama. Hevdîtina me ez anime ser wê bir û bawariyê, ku tu beri her tîştî întêrnasionalîst, mîrovekî demokrat, zaneyê rast, maqul û camêr bûyî, mezîna ra mezîn, biçûka ra biçûk bûyî û paşê hozanekî mezîn û hişyarkirê gelê kurd bûyî.

Ez mîrovekî piçûkîm, ku Cegerxwin qîmet bikim. Gelê me bî xwe ew qîmetê mezîn daye wî, ez jî lawêkî wî û lawêkî gelê kurdîm. Lê tîştêk diyare, ku pey mîrîna hînek mîrovan malek gundek sêwî û stuxar dibe, lê iro bî mîrîna Cegerxwin welatek-Kurdîstan û gelek gelê kurda ziyar û zirarê ket.

Me gelean dilê xwe da difîkîrî, ku emê hîn gelek cara di şayî û şayînetî da rastî Cegerxwin hozanê mezîn bîn, lê iro em şîna te dikin. Belê, emê jî bîmîrîn, le xwezi wî mêrî, ku wek wî bîjî, bî-xebite, ku heyra wî da be, hewcadarî dengê wî, nûr-nedera wî û qelema wî ya adan be.

Sala 1982'an gava ez berpirsîyarê pêlweşa Yêrêvanê ya Kurdi bûm, mîn cara pêşîn gotareke pîr mezîn ser Cegerxwin nivîsî, parçekî dengê wî yê li hevpeyvîna mine tevi wî xîste navê û di radyoyê da weşandinê. Ez wê gotarê ser kasêtê dinivîsîm û jî we ra dîşînim. Bira ew jî, jî aliyê mîn da we û malbeta wî ra bîmine wek biranîn, bibe dildîmiya ber dîla.

Parçek wê hevpeyvîne, ku Cegerxwin gotîye, mîrov dibe bona roja irogotîye. Ewî waha gotîye:

"Bî bawariya mîn, jîyana wî mîrovi, ku jî gelê xwe ra bî paqîjî, bî dîlpakî xebîtiye, bîmîrî jî saxe, nemriye, wê jîndar bîmîni. Tê bira mîn, wextê Bêkes mîrîbû, bûrjûazê kurdê Iraqê pere li ser tîrba wî bela dikîrîn, îcar keçekê rahişte ser perê wan û qetand, got, wextê Bêkes saxbû, kesi we qîrûşek ne dayê, jî birçî na mîr, iro Bêkes mîriye, ne mohtacê dinar û derhemê weye, Bêkes niha dilê xort û mêra da, dilê keç û jîna da cîkî bîlînd gîrtîye,

icar bızanbın, ku ewê bımını û namıre. Eger ez ji layiq bım, eger ez ji hêjabım weke Bêkes dı dılê xort û keça da, jın û mêra da bımınım, ez tım jındarım, ez tım saxım. Ez bımırım ji, ev hesti û goşt û cerm hemû herın, qımetê wan tuneye, bira herın, lê miletê xwe da bımınım."


Payize. Zûtirekê zıvıstanê ser kurda da bê, û çawa zıvıtanê ge lê Kurdıstanê dı hêla aboriyê da dıkeve rewşeke teng û gıran, nıha ji wahaye. Lê vê carê ser rewşa aboriyêye dijwar da rewşa kur daye dı hêla çande û edebiyatê ya gıran ji zêde bû. Gelê kurd dū lawên xweyê pır hêja wında kırın-Cegerxwin û Yılmaz Guney. Em ber mezinaya wan û xebata wan temene dıbın û serê xwe berjêr dıkın.

Çend sale ko em her wehe bın destê neyarın  
Bê rûmet û piştın.  
Wek kole lı çola û lı ser sêpi û daran  
Em hatıne kuştın.  
Axa û began perçe kırın ev milletê mêr  
Çalak û ciwanmêr.  
Em kırıne xulamokê neyar mayıne bêçar  
Tev bê seri hiştın.  
Ev şêx û mela rencberê dijmin bı şev û ro  
Tım jê re dıgo  
Herkes xwedi estol û ref û leşker û topın  
Lê ê me bı xıştın  
Zor û sitema vê tebeqê em hiştıne kavıl  
Bê xwendın û cahıl  
Lê hê ji lı ser me bı xwe ew kund û qırakın  
Tım gazi û qıştın  
Zengıne welatê me hemi kani û zêrin  
Em tev weki şêrın  
Rengıne hemi deşt û çiya av û giya ne  
Tek bax û bihiştın  
Herçendi berê em ji xwedi nav û nişan bûn  
Lê iro nezan bûn  
Herçendi berê em bı xwe gernas û egıt bûn  
Lê iro ne tıştın  
Ey xortê ciwanmêr, bese bêfêde ye ev rev  
Destî xwe bıdın hev  
Ronahi lı pey tari ye, tım roje lı pey şev  
Em nayêne kuştın.

**CİGERXWİN**

# Me YILMAZ GUNEY

## Winda Kır



Yılmaz Güney, dî roja 9'ê Îlona 1984'an da lî Parisê çavên xwe lî jîyanê girt. Bî mîrîna Yılmaz Güney, gelên me û dunya sine mayê hunermendeki hêja windakîr.

Güney 47 salî bû. Ev emrê han jî bo hunermendeki têkoşer wek Yılmaz Güney jîyanêke kurt bû. Pîraniya kesên hunermend, nemaze dî nav van salên kemilî û gîhiştî da, huner û efrandkariya xwe ya herî bilînd tinî meydanê. Ew naverok û şewayê hunera xwe dîghî-nî ser qîmet û qonaxên nû.

Filmên Yılmaz Güney yê dawîn nîmûneyên berbîçavî jî bo vê rastiyê. Dê hêla hunera sinemayê da Güney, dî qonaxêke zêrî da bû. Pîştî derketîna wî jî nav lepên faşîzmê lî derwayî welat jêra fersend û gangaziya xebatên nû peyda bîbû. Zehmetkêşên Tîrkiyê û gelê Kurd jî vî hostayê sinemayê gelek xebatên hêjatîr hêvidîkîr. Lê çî mîxabîn ku ew jî nexweşîya kansêrê xelas nebû û dî wextê xwe yê herî hêja da çû ser heqîya xwe.

Yılmaz Güney bî xwe jî malbateke zehmetkêş bû. Dê û bavê wî, jî Kurdistanê (Diya wî jî Mûşê û bavê wî jî Sîwêrekêye.) çûne lî Çukurova ciwarbûne. Güney dî zarotîya xwe û xortanîya xwe da jîyana mîrovên zehmetkêş, bî xwe jîya. Wî, ev jîyan derbasî serpêhatîyan kîr.

Yılmaz Güney, cara pêşî dî sala 1960'an da, jî ber serpêhatîyeke xwe hate girtî. Du (2) sal ceza jê ra bîrî. Jî van du salan 18 meh dî girtîgehê da derbasîkîr. Güney êdî jî wîr şûnda, polês û cendîrme, dadgeh û girtîgehên burjuvaziya tîrk lî pêşîya xwe dit. Dî sala 1971'an da disa ew avêtî zîndanê, jî ber ku alîkariya rêxîstîneke şoreşger kîrîbû. Dadîgehên burjuvazî 10 sal ceza jêra bîrî. Dî efûya 1974'an da hate berdan. Lê burjuvaziya kolonyalist çarekî navê Yılmaz Güney lî lista reş nîvîsîbû. Bî sansurê, bî cezayê girtîxanê azadîya Güney jê sîtandî, nehiştî ku bî serbestî bîxêbîte. Bî komployekî hakîmekî faşîst hate kuştî û ev bûyer avêtne sîtûyê wî. Heta reva wî jî girtîxanê (sala 1981'an) bo derwayî welat, dî girtîxanê da hate girtî. Bî vî awayî 12 salên wî dî girtîxanan da derbas bû. Lê Yılmaz Güney lî ber vê zulmê û zordestîyê sîtûyê xwe xwar nekîr. Bî mîrxasî berxweda.

Yılmaz Güney, wek gelek kesên dîn, xwe bî nav û dengê xwe û bî pereyên xwe pozbilînd nekîr û rûyê xwe jî gelê zahmetkêş neguhast. Ew, wek ronakbîreki hevdem, jî doza gelê zahmetkêş ra û jî neteweyê xwe yê bîndest ra dîrîst derket. Yılmaz Güney her dîçû hunera xwe bî awkî zanîstî, bî tekoşîna gel ya şoreşger va tamam dîkîr.




Yılmaz Guney ne tenê bî hunera xwe va, her wusa bî goşt û hesti yê xwe va tevi tekoşina siyasi bû. Dî ditinên xwe yê siyasi da hîn şaşî û xeletî jî kîr. Wek parastina têza Mao ku Yekitiya Sovyet Anti-Sosyalist dîdit. Herçend Yılmaz Guney dî tesira ditinên çewt da bû jî, iro em wî bî van ditinan bîbir naynîn. Dîvê rola wî dî nav tekoşina şoreşger da wek hunermendekî şoreşger, wek mêrxaseki gel bê biranîn û bê parastin.

Yılmaz Guney lî hember zordestiya netewî lî ser mîletê Kurd, bê deng nema. Gelek nîviskar û hunermend hene ku nîkarîbûn jî xwe ra bêjin em Kurdî, Kurd jî mîletekî. Ewan jî tecrîtbûnê, jî windakîrîna nav û kariyera xwe û rihetiya jiyana xwe dîrsîyan. Lê Y. Guney hemû ev tîştên han da aliyekî. Wî, bî mêrxasî lî dîjî zulma netewî dengê xwe bîlînd kîr. Guney dî gelek filmên xwe da motîvên jiyana gelê Kurd anî ber çavan. Filma "YOL" jî bo danasina Kurdîstanê lî dervayî welat roleke baş leyist.

Erê, iro lî Tirkîyê, rejîma faşîst, fîlm, pirtûk, afîş û wêneyên Yılmaz Guney qedexa kîriye û dîxwaze bî vî awayî nav û efrandinên wî bîde jîbîrkîrîn. Lê dîjîmîn xwe dîxapîne, hezkîrîn û sempatiya gel jî bo Yılmaz Guney wînda nabe. Jî ber ku wî dî dilê gelê me da, lî cîheki kûr û germ cîh gîrtîye. Zehmetkêşên Tirkîyê û gelê Kurd bî vî lawê xwe yê hêja serbîlînde .

## efrandînên y.guney



" Eger dî sinema Tirkîyê da, jî nav yê herî baş bîjartî bî çêkîrîn, yê yekem Yılmaz Guney e. Yê duwem sêyem, çarem disa ew e. Dibe ku rêza heyştan yan jî nehan da yekî din lî dî wî were. (Rejîsorê Tirk Lütfi AKAD. *Türkiye postası*. 9.12.84)

Yılmaz Guney dî xortaniya xwe da dest pêkîr bî edebiyatê va mîjûl bû . Paşê derbasi sinemayê bû û dî wî wari da serfîraziyên mezînişan da . Dî bî serfîraziya Yılmaz Guney da , sedemê bîngêhin ewe ku , wî belengaziya xelkê daxwaz, tevgêr û serhîldana gel dîkîr babeta filmên xwe. Mîrovên zehmetkêş xwe dî filmên wî da, dî listîkvaniya wî da dîditîn. Y. Guney bî wextê ra bû mêrxaseki gel, bû şervaneki sinema yê bî nav û rûmet.

ROMAN û SERPEHATÎYÊN WÎ YÊN SEREKE :

BİRGÜN (Rojek-1952)

BOYNU BÜKÜK ÖLDÜLER (Ew bî stûxarî mîrîn-1961)


SELİMİYE ÜÇLÜSÜ (Sêberiya Selimyê)  
 HÜCREM (Hucra min-1972)  
 SALPA -1972  
 SELİMİYE MEKTUPLARI (Nameyên Selimyê-1972)

## FİLMÊN WÎ

*bî kurti*

\*\*

" Cıvat kuda dıçın...çıma dıçın ?  
 û di vê çûyinê da wek şexis para  
 me çı ye? Em wek giha dıjin yan  
 em ji bo guhartina dunyayê di nav  
 irada tevayî da xwedipar û  
 berpırsiyar in ? "  
 (Y.GÜNEY. Hücrem-rûp.16)



Güney , jî sedan(100) zêdetır filman da, yan bî xwe leyistiye, yan jî senar yoya wan nivisiye û rejisori kırıye. Filmên wî yê sereke:

SEYİTHAN (Seyitxan-1968)  
 UMUT (Guman-1970)  
 AĞIT (Sıtrana şinê--1971)  
 ARKADAŞ (Heval-1974)  
 ZAVALLILAR (Belengazan-1974)  
 SÜRÜ (Keri)  
 DÜŞMAN (Dıjmin)  
 YOL (Rê)  
 DUVAR (Diwar)

SEYİTHAN (Seyitxan)- Film lî Kurdistanê hatiye kişandin û edet û kev neşopiyên kurdan babet dıgre. Dî vê filmê da, çıma ku navên kurdi derbas dıbin, beşdarbûna wê dî festivalên navnewî da hate qedexekırın.

UMUT (Umûd)- Y.GÜNEY dewreke nû vekır dî sinema Tırkiyê da. Ev film bû destpêka realistiye dî sinema Tırkiyê da "Umûd" bala dinya sinemayê kışande ser xwe.

SÜRÜ (Keri)- Babeta filma "Keri" serpehatiye eşireke koçerên kurde ku keriya pezê xwe jî Kurdistanê dibine Enqerê. Vê filmê lî Ewrûpayê rexneyên baş girt.

YOL (Rê)- Filma "Rê" dî festiva la Navnetewî ya Cannes-1982'an da bû filma yekem û xelata zêrin wergirt , lî cihanê nav û deng da. Jî bo danasi na Kurdistanê û rewşa gelê kurd propagandayeke hêja kır.

DUVAR (Diwar)- GÜNEY ev filma dî 1983'an da lî Fıransayê çêkır. Babeta wê lî ser girtigeha zarokane. "Diwar" filma GÜNEY ya dawiyêye.

# Hevpeyinek

Bı

## LAZEREV Ra



Çawa tê zanin kovara Roja Nû di her hejmareke xwe da cih dide heypeyvînan, jı bo hınbûna bir û baweriyên zaneyên kurd -û biyani yên ku ser kurdan serê xwe dêşinin û jı bo danasina wan ew vê yekê pir kerhati dibinin. Vê carê me heypeyvînek bı zaneyê dirokê Prof. M.S. Lazerev amade kir. M.S. Lazerev dı heypeyvîna xwe da bersi va pirsên heval Kurdox dide. Çawa tê zanin Prof. M.S. Lazerev iro lı ser diroka kurdan wak pısporeki mezin tê heşibandın. Lı ser pırsa kurdan, bı taybeti lı ser diroka kurdan vekolinên wi yên kûr û fıreh hene, misal wi dı sala 1972'an da "Pırsa Kurdan 1891-1917" bı vi navi va lêgerîneke mezin weşand. Tenê ev pirtûka wi 472 rûpele, û tenê keriki diroka kurdan vedikoline. Em lı jêr vê heypeyvîne pêşkêşî xwendevanên xwe dıkin.

ROJA NÛ

PIRS: Mamostê berêz Mixail Semûnoviç!

Gelo hûn dıkarın xwe bı xwendevanên Roja Nû ra bıdın nasin?

LAZEREV: Ez dı 8 meha gulanê, sala 1930'da lı Moskovayê jı dayika xwe bûme, bavê mın Sêmên Yakobleviçe, ew beri şoreşa Oktob-rê hevparê çalak û jir bû, dı tev gera şoreşgeri da lı Ukranya. Hingê Ukranya dı bin destlata Împiratoriya Rusi da bû, niha bûye komareke sosyalist lı Sovyetistanê, Bavê mın endamê partiya komunist bû û demeke dirêj dı nav leşgerê sor da komisar bû, berpırsi yarê rêzani bû, beri mırine xwe, ewi serokati lı rêvebırına rêxistina avakırına bajarên nûh dıkir.

Diya mın Êlina Sêmenovne Golocinskaye, profesorê kimyayê ye niha lı mal daniştiye û kar nake.

Mın dı sala 1947'an da xwendegehe navin lı Moskovayê kutakır û fa kulta dirokê xelas kır.

Pırs: Mamostê delal Mikayil Sêmunoviç! Hûn dıkarın çend gotın lı ser xebatên xwe bêjin?

LAZEREV: Belê, bı şabûneke mezin. Mın weke sed karên zanisti daye çapkırınê, bı taybeti ew nıvisar lı ser diroka Tırkiyê, welatên erebi, Kurdan û Kûrdistan, pêwendiyên navgelan lı rohilata navin û wısa jı lı ser pırsa netewi lı welatên berpêşdaçûji lı Asiya û Afrika da hatine weşandın. Hın jı nıvisarên çapbûyi evin:

1 - "Rûxandına destlata Tırkan lı Rohilata Erebi"

2 - "Seudi ya Erebi"

3 - "Pêşvaçûne Bingehın Dı Rêzaniya Dervada"

û pır gotar û bîrên dın, dı xebatên hevteyayida (koliktivi) wek:

- 4 - "Rêzaniya Emêrikaya Yekbûyi L1 Rohilata Erebidâ"
  - 5 - "Rêzaniya Engilistanê L1 Rohilata Nêziki û Navin"
  - 6 - "Diroka Nûhtirin ya Welatên Erebi"
  - 7 - "Rêveçêna (protsêsa) Netewi L1 Welatên Rohilata Nêzik û Navin"
  - 8 - "Pêwendiyên Nav Gelan L1 Rohilata Nêzik û Navin da Pîştî Şerê Cihanê Dudiyan Da"
  - 9 - "Problêmên (pîrsên) Netewi L1 Rohilata Nûjenbar"
  - 10- "Pîrsên Netewi l1 Welatên Rohilatê"
  - 11- "Diroka Cihanê Beşê 10'an (b1 zımani rûsi çend gotarên mın d1 wır da hene)
  - 12- "Rohilat û Dema Niha"
- Her wisa ji pirtûkên mın l1 ser Kurd û Kurdistanê ji evın:
- 13- "Kurdistan û Pîrsa Kurda"
  - 14- "Pîrsa Kurda" 1891-1917

Û pır gotar û bawerdanên mın d1 kovaran da hatine weşandinê, j1 bo nimûne, mın pêşgotinek l1 pêşiya romana niviskarê kurd Bawê Nazê "Çiyayên B1 Xûnê Hatine Avdan" nivisiye. Ew b1 zımanê kurdi ji d1 Roja Nû" da hatiye çapkırın, disan ji, mın gotarek dirêj b1 sernavê "Kurd û Pîrsa Kurda" d1 kovara "Asiya û Afrika İro da" hejmara 12'an, sala 1983'an da weşand. Wergera vê gotarê ji, b1 zımanê kurdi d1 "Dengê KOMKAR" da çapbûye, divêt welatperwerên Kurd wan gotaran bixûnın, ewi berjewendê û sudê j1 wanbıgrın û b1 binın.

PIRS: *Mamostê berêz! D1 kar û xebatên teva hat diyarkırın, weki hûn ne bes dirokzanın lê hûn wısan ji rêzaneki gewrene, j1 berwê, wê geleki xweşbe, gava hûn çend gotın û şiretan l1 welatparêzên Kurd bıkın.*

LAZAREV: Beri her tıştı dıxwazım bêjım, gelê Kurd wê bıgije mafê xwe yê netewi û serbest û azad bıji, lê rızgariya gelê Kurd tenê l1 ser rêça Marksizmê-Lêninizmê dıbe, xurtkırına baweriyên zanisti û şoreşgeri d1 nav xebatkar û cotkarên Kurdistanê da b1 hev kariya navnetewi b1 karker û şoreşgerên Tırk, Farıs, Ereban ra û her wisa ji b1 hemû prolêtarên cihanê ra l1 diji derebegiyê û kapitalizmê, û impıryalizmê dıbe. J1 aliyê dın da, pêwıste hemâ hêz û welatparêzên kurd d1 nav xwe da hevkarıyê û enıyeke fireh b1 pêkbinın û divêt bernama hevkarıyê ya gelemper, pêşverû û şoreşgeri be, l1 diji çeprewi be, l1 diji kevneperestiyê be, l1 diji impıryalistiyê be û dostaniyên xwe b1 rêxıstınên pêşverû ra, welatên sosyalist ra b1 pêşengiya Yekitiya Sovyet ra xurt bıkın. Çımki d1 sistema sosyalistiyê da, çare l1 pırsa netewan dıbe û hemû karker û cotkar j1 çewsandına derebegan, sermiyandaran azad dıbin. Evin şiretên mın b1 kurtebıri, ez hêvi dıkım mın bersiv da.

PIRS: *Zor sıpas mamostê hêja, pırsa mın ya dawı eve, weki we dit kovara "Roja Nû" û "Dengê KOMKAR" gotarên we b1 zımanê kurdi b1 xwendevanên xwe dan nasın û her wisa ji kovara "Pêşeng" l1 Kurdistanê derdıkeve ew ji d1 çend hejmarên xwe da û hin berdeyam dıke, pirtûka we "Pırsa Kurda" 1891-1917 werdigerine zımane kurdi. Hûn l1 ser vı kari çı kanın bêjın?*

LAZAREV: B1 kurti dıkarım wusa bêjım, ev yeka dıde xuya kırın ku tevgera Kurdi pêşda dıçe, şoreşger û pêşverûyên Kurd dost û dijman j1 hev nasdıkn, beweriyên xwe b1 weşanên Sovyetistanê tinın û werdigerinın zımanê Kurdi. Eva propegendeke hêjaye. J1 rêzaniya

û helwesta welatê me ra, welatê me her tım alikariya tevgerên aza dixwaz kırıye û dıke, her dem siyaseta riçperstan, şovınistan lı hember gelên bındest şerpeze kırıye. Çımki ev ji şırêt û waneyên me mamostê karkerên cihanê V.İ. LENİN e.

Ez lı dawiyê, jı hemû rojname û kovarên Kurdi yên pêşverû ra pêşketın û serfırazi dixwazım, hêvidarım ku ew tım bıbın dengê rast jı Kurdistanê ra û lı dıji dijminên wê bı xurti têkoşınê bı-kın û her dem bıbın hevalên dılsoz jı rojname û kovarên pêşverû-yên cihanê ra. Pêşveçûna weşanên Kurdi, pêşvecûna tevgera niştıma niya Kurde. Ew herdu ji, serkewtına gelê Kurd nêzik dıkın û hêvi-ya rızgariyê xurt dıbe.

*Zor sıpas mamostê berêz, ez bı navê kovara "Roja Nû" we zor sıyas dıkım û hêvidarım ku niştımanperwerên Kurdistan tım berhem, pırtûk û gotarên we zanısti bıbının û wergerının zımanê dayik, em çaweriya nıvisarên wene. Careki dın zor sıpas!*

## 10 Saliya PSKT'yê



Jı ber tıjıkırına 10 saliya Partiya Sosyalista Kurdistana Tır-kiyê, lı dervayi welat 2 şevên pirozboyiyê hatın amadekırın, yek jı wana dı roja 3.11.1984 lı Elmanya Federal, lı bajarê Kölnê, şeva dın jı, dı roja 17.10.1984'an lı Swêdê, bajarê Stockholmê hatın pi-rozkırın.

Dı van herdu şevan da jı, gelek mêvan û kes beşdar bûn, wusan jı gelek sılavname û mesaj hatın xwendın.

Lı bajarê Kölnê nêzkaya 1200 kes, dı şeva pêşin da beşdar bû, he-mû salon tıji bû.

Şeva Stockholmê da jı disa gelek kes amade bûn û 600 kes hate şevê, kurd, tirk, swêdi û jı gelên mayin gelek mırov hebûn dı vê şe-vê da.

Dı herdu şevan da Sekreterê Partiyê Kemal Burkay peyivi û lı ser karên partiyê û lı ser dehsaliya partiyê baweriyên xwe pêşkêş-kır.

Dı şevên Kölnê û Stockholmê da gelek stranên gelêri, komên folk-lorê, helbestên kurdi jı mêvanan ra hatın pêşkêşkırın. Dı warê çan-di da herdu şev jı gelek dewlemend û rengin bûn.

## Evina Dîlê Mın

Dîl bîdın mın  
Çiyano  
Dîl bîdın mın  
Mîl bîdın mın  
Bırano  
Mîl bîdın mın  
Ezê rakım  
Sin û sinor  
Jı evina welat.  
Hew dıkarım  
Bıminım dūr  
Ezê rakım koledari  
Azad bıkıım vi diyari  
Roja welat  
Waye hılat,  
Hat dawiya rojên tari  
Ezê rakım zordestiyê.  
Bıla rabın  
Hile û xurde, vır û derew  
Her tışt bêtın  
ser rastiyê  
Her çar sinorên derewin  
Ezê rakım  
Bı sond û evin.  
Sipan û Zaxros û Hemrin  
Pête dîlê mın  
Dax û birin.  
Çiyano! dîl bîdın mın  
Bırano! mîl bîdın mın  
Niştıman! guh bîdın mın...  
Herê canê...  
Kena te  
Wek gulê bıharêye  
Can dîde, rih dîde  
Dest û piyên mın  
Dîde birkırın  
Bırına canê mın  
Ango,  
Berika te ye  
Berika dîlê mın  
Stêrkên te ne  
Dınıqıtın jı çavên mın  
Tu dı nav tariyan da  
Sır û seqem  
Ba û baxozan da  
Wek kulilkên berfê  
Şin bûyi.  
Tu dı nav şerê azadiyê da  
Wek pola û hesın  
Bir û bawer bûyi.  
Herê canê...  
Çavnêrê te me  
Çavnêriya te dıkım  
Wek teyreke fırdayi  
Jı destên mın.



Ez lı te dıgerım  
Ez te nabinım.  
Hesret mın  
Hesreta mın wek Ferat'e  
Çiyayê bılind, Ararate  
Ne ku tım tê waha bımeşê  
Rojên pêş, wê gelek xweşbın.  
Dıjımın dın û hare  
Xwinmıje, kedxware  
Me jı hev dūr dıke.  
Gulên me dıçelmısine  
Jıyan lı me wêran dıke  
Xwına me dımıjine.

Herê canê...  
Derdê me yek nine  
Dîlê me birine  
Ev belengazi  
û rûreşiya me  
Dıjımın dıkenine.  
İro em sebr dıkın  
Sebra me niştımana evine.

Herê canê...  
Halê me jar û xızane  
Xılasi bı dîl û cane  
Baş bızane,  
Derdê me  
Jı me baştır kes nızane.

Herê canê...  
Meydana bê mêr,  
Mırına bê şer û  
Bê welatê azad  
Evina bê hêvi  
Çıye...?  
Dîlê bê çek  
Tekoşına bê baweri  
Bı karê kiye?  
Em jıyanê dıparêzın  
Ne mırına bı esiri  
Em mırınê jor dıbinın  
Jı jıyana bıdesti...  
Eve şıara me  
Ku bılind dıbe  
Jı çıya.  
Eve şıretta ewıl  
Jı bo zarûkan, jı diyar...

Herê canê...  
Bı evina te dıjım  
Bı hêviya te sebr dıkım  
Hêvi mıl daye evinê  
Eve ku sebra me tine.

BARGIRAN  
KURDİSTANA TIRKIYE

# ORDIXANÊ CELİL

## Kiye?

Kovara Rôja Nû, dî vê hejmara xwe da lî ser kar û xebatên zanayê folklorê û kurdnasê navdar Ordixanê Celil disekine. Dî warê berevkîrîna nî mûneyên folklorê kurdi, vekolandin û şirovekîrîna bîngêhên wê, analizên lî ser folklorê kurdi û dî warê danasîna folklorê da bî rastî keda Ordixanê Celil gelek derbaz bûye. Heta niha bî dehan efrandinên wî hatine çapkîrîn. Wî, wusan jî, lî şer hunera seyda Cigerxwin vekolînek weşandiye. Ev vekolîna lî ser helbestên Cigerxwin (Helbestên Cigerxwin Yên Bajarvaniyê 1966. Rewan) dî vi warî da efrandinê yekemine. Ordixanê Celil wusan jî helbestan dinivise.

Lî jêr lî ser şaxsiyeta Ordixanê Celil, xebatên wî, em nivisarek pêşkêşî xwendevanên xwe dikin.



### KURDOX

Dî vê gotara xwe da emê bî hurgîlî lî ser folkloristê mezîn Ordixanê Celil bîsekîrîn, kar û xebatên wî, jî xwendevanan ra bîdî naskîrîn.

Ordixanê Celil 24'ê meha Gelewêjê, dî sala 1932'an da lî Rewanê hatiye dinê. Dê û bavê Ordixan jî gundê Qızêlgulê lî bajarê Dîgorê ne. Dî sala 1914'an da bavpirê Ordixan jî Kurdistana Tirkîyê dîrevî û dîxwazî derbazî Urîsetê bî, lê mîxabî ew lî ser sînor hatî kuştî, bavê Ordixan sêwî dîmîne û dî sêwîxanekê da mezî dîbe.

Pîştî serketîna şoreşa Oktobrê çawa tê zanî Ermenîstana Sovyetê avakîrîn, bavê Ordixan bextewar dîbî, rê lî pêşîyan vedîbe û dîçî xwendegêhê dîbî ronakbîr.

Ordixanê Celil dî nav hoyê û mercên rewşenbîrîyê da perwerde dîbe, rîya durust nas dîke, dî sala 1951'an da xwendegêha xwe xelas dîke yekser dîkeve zanîngêha Rewanê, dî wîr da beşa edebîyatê dîxwîne û vê beşê dî sala 1955'an da dîqedîne.

Ordixanê Celil dema hê xwendekar bû, dî nav gel da çîrok, stran, û efrandinên mayî berev dîkîr. Dî sala 1955'an da lî Rewanê radyoya Kurdi vedîbe, Ordixan dîbe nûçebêj dî radyoyê da, ew wusan jî, dî wê demê gotaran, helbestan û tîştên mayî dî jojnama "Rîya Teze" da dîweşîne.

Dî sala 1957'an da Ordixan dîçe bajarê Leningradê, lî wîr lî bal kurdzanên mezîn Orbêlî, Qanadê Kurdo xwendîna hî jî pêştî dîbe. Lî ser destana gel "Xanê Destzêrî" (Serpêhatîya DIMDIM) doktorîyê çêdîke. Ordixan dîbêje: "Mî dîxwast dî vê pîrtûka doktorîyê da hî rastîyan bîdîm ber çavan, gelê kurd çawa berî 350 salî mîrxas bûye û zordestîya Şêx Abas qebûl nekîrîye, lî dîjî wî şer kîrî

ye, Lê disan ji dijmin serketiye, jî ber ku noker û axa dî nav kur dan da hebûn wek Mehmût Melekani, jî aliyê dîn yekbûnek ji, dî nav kurdan da tune bû.

Ordixanê Celil jî bo zarokên, ku dî sînifa çaran da dixweyinin, pirtûkeke xwendinê dî sala 1969'an da çap dîke. Dîsa dî wê salê da ew destpêdîke "Mesele û Metelokên Kurdi" dîweşîne û ewana dî nav du pirtûka da berev dîbin.

Dî sala 1974'an da Ordixan bî birayê xwe Celil va pirtûkeke bî navê "Çirokên Gelê Kurd" pêşkêşî xwendevanan dîke. Dî nav rûpelên vê pirtûkê da gelek çirokên hêja cih dîgrin, wek Ebo Zeb, Ebo paşa û Memet paşa, Sewa Sêling, Saro û Bîlbîl, Mîrêdê Zozani û gelekên ma yin.

Ordixan dî sala 1975'an da, bî navê "Stranên Gelê Kurd Yên Dirokî" xebateke dîn va derdîkeve pêşîya me. Ev pirtûka, dî sala 1977'an da, jî aliyê Akademiya kurdan lî Baxdadê da tê çapkîrîn. (Bî zaravê Sorani bî tipên Erebi) Dî ve berevokê da ji gelek stranên heweskar cih girtine, wek Şêx Mirze, Şerê Zilan û Heyderan, Îsmail Axa - Sîmko, Şêx Mehmût, Şerê Gîridaxê..

Dî sala 1978'an da Ordixan û Celil herdu bîra lî ser folklorê kurdan berevokê gelek fîreh û hêja dîdîn weşandin. Ev berevoka bî navê "Zargotîna Kurda" wek du beşan hatîn weşandin. Ev xebata hêja bî tipên latîni hatîn çapkîrîn, jî ber vê yekê ev efrandîna lî gelek beşên Kurdistanê û Ewrûpê ji, dî nav xwendevanên kurd da belav bû û hate xwendin. "Zargotîna Kurda" dî warê nasîna folklorê kurdî da valahîke mezîn tîjî kîr û gelek nîmûneyên folklorê kurdî jî wundabûnê xelas kîr.

Gelek çirokên ku, Ordixanê Celil bî birayê xwe Celil va tevayî berevkîrîne, bî zîmanên bîyanî hatîne weşandin. Wek Kurdisch Märchen (dî sala 1978'an lî Elmanya Federal) û dîsa Zîna Celil çend çirokên van folklorîstên kurd vergerandiye bî zîmanê Letonî. Pirtûkeke lî ser zargotîna kurdî ji pêwîst bû bî zîmanê Erebi bîhata



Cigerxwin û Ordixanê Celil

çapkîrîn, lê mîxabî dî nav şerê Lubnanê da ev pirtûka hat şewîtan dîn.

Ordixanê Celil wusan ji helbestvane, helbestan dînivîse. Dî sala 1955'an da cara yekem wî dest bî nivîsandîna helbestan kîriye û



helbestên pêşin, dî rojnama "Riya Teze" da hatin çapkîrîn. Dî sala 1959'an da pirtûkeke wi ya helbestan lî Rewanê bî navê "Helbest û Poem" hat weşandin. Wi disa destanek bî navê "Têli Hemze" nivîsiye ew destana lî ser şerê kurdan lî dîji hukumeta Tirkîyê hatiye nivîsandin. Gelek helbestên wi jî bî zîmanê bîyani hatine çapkîrîn, wek "Dota Kurd Tu Delaliya Mîni", "Zîmanê Kurdi", "Awazê Kurd" û "Evar Bû".

Ordixanê Celil bî rasti tenê ne folkloriste, ew wusan jî zanayê edebiyata kurdiye. Wi dî sala 1966'an da "Helbestvaniya Cigerxwin Ya Bajarvaniyê" vekolinek lî ser naveroka helbestên Cigerxwin nivîsi. Bî çaveki diroki, politik, edebî û cîvaki bîngêhên helbestên Cigerxwin dî vê efrandinê da hatiye vekolandin. Ev pirtûk bî Rûsi, Kurdi û Îngilizi bî sê zîmanan hatiye çapkîrîn.

Ordixanê Celil endamê Yekitiya Rojnamevanên Sovyetêye, endamê Akademîya Iraqê û endamê şerefê yê Enstituya Kurdi lî Parisê ye.

Mamoste Ordixan dibêje "Hîn pîr karên minê mayin jî hene, ez hê vidarim ku ez wana jî bîdîm çapkîrîn".

Ordixanê Celil niha karên xwe lî Enstituya Rohlâtzaniyê, Beşa Kurdi da dajo.

## Bî Kurti...

■ Berî çend meha zanayê zîmanê kurdi Qanadê Kurdo 75 saliya xwe tîji kîr. Jî ber tîjikîrîna 75 saliya Q. Kurdo lî Leningradê cîvînek taybetî hate pêkanîn.

■ Nivîskarê Kîrkîz Cengîz Aymatov berî çend meha hate lî Swêdê. Cengîz Aymatov, bî navê "Hevaltiya Swêd û Yekitiya Sovyet" dî cîvînekê da beşdar bû. Ew lî ser edebiyata Sovyet û karên xwe peyivî.

■ Dengbêjê kurd Şîvan û dengbêja Tîrk Melike Demîrağ bî hevra çend konser lî bajarên Elmanya Federal amadekîrîn. (Berlîn, Köln, Hannover, Marburg)

■ Enstituya Kurdi lî Parisê bîryar da wekî bursê bîde şeş xwendekarên kurd. Ev bursê dî warê zîmanzani, dirok, etnolojî, cîvakkasî, hwd...bên dayîn.

■ Dî roja 3-11-1984' a da lî bajarê Sydney lî Australya komcîvîneke mezin jî bo biranîna Yılmaz Güney û Seyda Cigerxwin hat amadekîrîn. Dî cîvînê da wusan jî nivîskar û helbestvanê Australî An ne Fairbairne helbestek xwend.

■ Lî Stockholmê, dî roja 7-12-1984'an da helbestvanê Felestînyên navdar Mahmud Dewrêş û Samî Al Kasîm helbestên xwe xwendin û dî warê bilîndbûna tekoşîna netewî da rola huner û çandê peyivîn.

■ Bî navê "Welatê Me Kurdîstan" vidok jî aliyê Mahmut Baksî û Elin Klasson da hat amadekîrîn. Film lî Kurdîstana Suriyê hatiye kîşandin.

■ Nivîskarê Kurd M. Emin Bozarîslan jî bo zarokên kurd, pirtûka çaremin bî navê "Serketîna Mişkan" nivîsi û lî Stockholmê hat weşandin.

■ Lî Elmanya Rojhîlat berevokek lî ser efrandinên nivîskarên Swêd hat weşandin. Dî nav vê berevoka mezin da wusan jî serpehatiye Mahmut Baksî bî navê "Îhsan" hatiye weşandin. Navê pirtûkê "Schweden Heute-Ein Lesebuch".

## Du Diplom

Du xwendevanên kurd lî Yekitiya Sovyetistanê, lî ser rewşa kurdan ku diplom pêkanin. Karê wan hevalan bo rewş û naskirina gelê kurd kareki hêjaye.

Ev her du diplom ji, dî nav sed diplomayida ketin nav her sê diplomên nerxa baş standî.

Em naveroka van diplomaya pêşkêşî xwendevanan dîkîn.

Diplomek lî ser jinên Kurdistan hatiye amadekirin, navê wê "Jinên Kurdistanê û Kurdistan" e, xwediyê diplomê Leman İbrahim'e.

Ya dî, lî ser navê "Rola Dengê Komkar Dî Tevgera Rîzgarbûna Kurdistanê da" jî aliyê Macit da hatiye nivisandin.

"Jinên Kurdistan û Kurdistan"

Diplom jî du beşan pêkhatiye. Dî beşê yekemî da rewşa jinên Kurd bî rewşa jinên Erebb va hatiye qiyaskirin. Çawa tekoşîna jinên kurd dî nav jiyîna gelê kurd da berdewam dîke û lî ser rola jin û mêran hatiye rawestandî. Lî ser dîroka jinên kurd û cîyê wana dî dîrokê da çîye? Jin û cîvata kurdan û cîyê wana û tevgera gelê kurd netewî da cîyê jinên kurd çîye, têye rawestandî.

Beşê duwemî da jinên Kurdistan dî nav politikê da cîyeki çawa dîgre? Lî ser van pîrsan diplom hatiye nivisandin.

"Rola Dengê KOMKAR dî tevgera rîzgarbûna Kurdistanê da"

Diplom 118 rupel dî bin ew navan da hatiye nivisandin. 1- Dengê KOMKAR û tevgera azadixwaza Kurdistanê. 2- Dengê KOMKAR û tevgera şoreşgerî lî cihanê. 3- Wêjeya kurdi dî dengê KOMKAR da. 4- Mîrôvên gernas lî cihanê û lî Kurdistanê dî Dengê KOMKAR da. 5- Dengê KOMKAR û pîrsa jinan. 6- Dengê KOMKAR û tevgera xwendekarên Kurdistan lî dervayî welat. 7- Dîroka kurdan dî Dengê KOMKAR da. 8- Dengê KOMKAR xwendegêha zîmanê Kurdiye.

## WEŞANÊN ROJA NÛ

- 1- Ronak Diwana 4'an, Cigerxwin, Stockholm 1980
- 2- Zend-Avîsta, Diwana 5'an, Cigerxwin, Stockholm 1981
- 3- Kîlam û Mîqamed Cîmeta Kurda, Cemîla Celîl, Stockholm 1982
- 4- Şefaq, Diwana 6'an, Cigerxwin, Stockholm 1982
- 5- Zozan, Casîmê Celîl, Stockholm 1982
- 6- Hêvî, Diwana 7'an, Cigerxwin, Stockholm 1983
- 7- Tarîxa Edebiyata Kurdi 1, Prof. Qanadê Kurdo, Stockholm 1983
- 8- Dîmdîm, Erebb Şemo, Stockholm 1983



## Zaroxana Kurdi

D1 sala 1984'an da l1 Swêdê bajarê Stockholmê eva cara yekemî-  
j1 bo zarokên kurdan zarokxanek vebû. D1 vê zarokxanê da 15 zarokên  
kurd diminin û salên wan d1 navbera 1 û 6'an da diguhurîn. Zarok  
sibê zû radîbîn dîçîn zarokxanê û heta seet 6'an l1 wir diminin.  
D1 zarokxanê da 5 personal dîxebitîn, j1 wan du kes Swêdî û sê  
kes j1 kurdi.

Ev zarokxana kurd, l1 taxa Tenstayê da vebû, ev taxa d1 nav erdê  
Stockholmê da dimine. Îro nêzkaya 500 kurd l1 wê hêlê diminin. L1  
ser vebûna vê zarokxanê rojname û kovarên Swêdê gelek nivisarên  
baş weşandin. Rojname Swêdê ya here mezîn "Dagens Nyheter" nivîsi  
weki ev zarokxana kurdan ya yekemine ku l1 Ewrûpayê vebû, paşê roj  
name nivîsi weki "zarok wê zîmanê xwe şûnda bîstinîn". Serokê vê  
zarokxanê Birgitta Hedman l1 ser zarokxanê, d1 rojname Dagens Nyhe  
ter da baweriyên xwe weha şirovedike: "Mebest ewe ku, em zîmanê  
wan yê dê j1 nû va diyari wan bîkîn. Pîraniya wan b1 Tırki dîpeyi-  
vîn. Em dîxwazîn vê rewşê bîguhêzîn. Dê û bav dîxwazîn ku zarokên  
wan kurdi û swêdî fêr bîbîn. J1 bo ku d1 dîbîstanê da xwendîna xwe  
baş bîqedînin û j1 bo jiyîna l1 vê welatî hêsatîr bibe, ew pêwîste  
swêdî hin bîbîn, kurdi j1, j1 bo ew zarok bîghêjîn şexsiyeta xwe ya  
kurdi."

Beri çend roja hukmeta Tırkan, j1 bo vekîrîna zarokxaneke kurdi  
hukmeta Swêdê protesto kîr. Wekilê hukmeta Tırk, şirovekîr weki l1  
Tırkiyê herkes pêwîste Tırki deng bîke, ew personelê ku vê zarokxa  
nê da dîxebitîn hevvelatîyên Tırkîn, zîmanê kurdi l1 Tırkiyê qede-  
xeye, çawa dibe l1 Swêdê zarokxaneke kurdi vedibe û tê da kurdi tê  
dengkîrîn.

Hemberî van êriş û dîriyên hîşk, hukmeta Swêdê b1 nermî bersiva  
wan da, got weki, ev karê vekîrîna zarokxanan karên Belediyane, ew  
serbîxwe ne, ew wek hukmetekê nîkarîn têkîlî karên wan bîbîn.

Hukmeta Tırk rasterast dîxwaze weki hemû welatên Ewrûpi, wek  
wan zordestîke hîşk l1 ser kurdan bajon, qet maf û azadiyên wan tu  
nebîn, Lê b1 rastî hukmeta Tırk b1 van kîrînen xwe va roj b1 roj  
rûreş, sosret û rezil dibe.

## BRECHT



Bertolt Brecht nivîskar û helbestvanekî Elmanyê. Wî jiyana xwe bo karkerên welatê xwe û yê cihanê pêşkêş kir.

Brecht di sala 1898 an da li bajarê Augsburg hat rûye dinê û di maleke burjuva da mezûn bû. Bavê wî ew kîr zanîngê û jî hêvi kîr ku ew bibe doktor. Lê belê Brecht dest jî xwendina doktori berda û xwendina edebiyatê bo xwe kîr armanc. Di demekî da nîvê wî wek nivîskar û helbestvanekî bî qedr û qîmet belav bû, bî taybetî li bal karkeran û mirovên zana. Brecht di Şerê Cihanê Yekemîn da dit çawa mirovên belengaz bo ceng û şerê qatên serdest dibûn êzîng. Bêtar û ne-merovti û hevkuştin, yê di cenga mezûn da cih girtin, Brecht kîrî merovek pasîfîst yê ku pêûsa xwe li dijî qatên serdest û burjuva û bo mafên karker û rênçberan hertîm kar kir.

Dema Nazi li Elmanyê hatin ser hukûm, Brecht bî dîlşîni welatê xwe berda û di navbera salên 1933 an û 1939 an da li welatên Skandinavya rûnişt. Paşê ew çû Emerîka Yekbûyî û çend sal jiyana xwe li wir derbas kir. Lê belê dû seknandina Şerê Cihanê Duwemîn hukûmata Emerîka erd li Brecht teng kir û dest pêkir teşqelan bo wî peyda ke çûku rûniştina miroveki sosyalîst wek Brecht yê bî nav û deng li hesabê Emerîkê nedîhat. Di sala 1947 an da Brecht xatîr jî hevalan xwest û got: "Çêtîre ez jî vi welatî herîm, hukûmata Emerîka dixwaze bêbextîyeke mezûn li dijî min peydake".

Brecht vegeriya Ewrûpê û li bajarê Berlîna Rojhilat jiyana xwe domand. Li wir ew bû serokê BERLÎNER ENSEMBLE û ta roja mirîna xwe, 14 Tebaxê 1956, di rewşa pêşvebirîna tiyatroya karkeran da rolek mezûn list.

Piyêşên tiyatroya, çîrok û helbestên Brecht iro jî li ber çar hêlên cihanê bî nav û deng in. Nivîsên wî jî hela xwendekarên Edebiyetê da li zanîngê cihanê da iro bî eşq û meraq tî xwendin.

Welatê me iroj bûye yê dilreşan  
Pîr teng bûye li ser ewên pak û ciwan  
Û xwedê jî destan nade ewên xîzan.

Çîma xwedê tank û tîfeng, top û qurşîn  
Nedan ewên bîndest, ewên birçî û dîlşîn?  
Hêstîr wîlo nedîbarîyan; nedîrjîya xwîn.

Însanetî li cihanê iroj tîştêk pîr pîr zore  
Ewê dîlgewr zîkî birçî, ewê dilreş zîkî têre  
Ewê dîlpak xas û bêwar; bo dilreşan xêr û bêre.

Bo ç1 pêxember nayên cem ewên rênçber, ewên bê nan?  
Bo ç1 ew nadin wan pere; çima ew nadin wan arvan?  
Wilo birçibûn dare der; rindi û xweşi têne meydan.

Bo c1 xwedê qe pîrs nake j'ewên dilreş  
Çima ew dijîn ser piştên ewên keleş?  
Bo ç1 dest nade ser tank û balefîran;  
Yan wan nake destên ewên keti û xîzan?  
Wilo cihan zor baş nabe, dibe cîwan  
Gel şa dibîn; dibîn rîzgar j1 xwinmîjan. (B.BRECHT)

Ş.BEKIR

## AGAHDARÎ

Yek j1 armancên gewheri yên beşê kurdi l1 xwendîngeya bîlînd (berz) ya mamostetiyê l1 Stockholmê ev e, ku xwendkar hem zîman û edebiyat û dirok (mêjû) a kurdan bixwinin û hem j1 bi awaki raste rast têkevîna nav pîrs û pîrsgirêkên ku di edebiyata kurdi û kurdî logiyê da hene û wan binasin. J1 bo bîci anînê vê armancê, em hewî dîdîna da ku her demsalê (werz, k1j) çend seminaran l1 dar bînin.

Seminara yekemîn di vê demsalê da (payiza 1984'an) di roja 29/9/84 de hat rêk xîstîna. Di vê seminarê da mamosta M. Emin BOZARSLAN l1 ser jina xwe ya edebî û rewşa çanda kurdi l1 Kurdistanê bakûr peyivî.

Programa mayî ya vê demsalê j1 sê (3) seminarên din pêk hat. Ev seminar j1 yên jêrin bûn:

1-Roja 29/11/84 kak Reşo ZILAN gotarekê bi navê " l1 ser çend dijwariyên nîvisîna zaravê Kurmancî" pêşkêş kir.

2-Rojên BARNAS, Mu'eyed TEYÎB, Fîrat CEWERÎ çend behremên xwe (helbest û çîrok) xwendin û lîser tecrûbe û azmûnên xwe yên edebî peyivin. Piştî kesên di seminarê da beşdar bûbûn di gel hevalên nî viskar gotûbêj kirin.

3-Roja 12/12/84 dê Dr. Bo UTAS, ku l1 zanistgeya Uppsalayê mamoste yê zîmanên Îranî ye, seminarekê lîser "Terîqetên Sofîgeriyê l1 Kurî distanê" pêşkêş kir. Seminara Dr. Bo UTAS û gotûbêja di gel wi bî zîmanê Swêdî bû.

Em l1 vîr carekê din pêwîst dibînin ku bîdîna zanîna, seminarên xwendîngeya me ne bi tenê j1 bo xwendkarên kurdi ne, lê belê j1 bo hemû kesên vekirî ne. Her kurdek dikare têda beşdar bibe û gotûbêj bike. Em ditînin, rexne û pêşniyazên her kesekî bi dilekî xweş werdigîrin. J1 bo demsala buharê j1, em dê programa seminaran di demekî nêzik da belav bikin.

Ferhad SHAKELY  
Beşê Kurdi-Xwendîngeya Berz ya Mamostayeti  
l1 Stockholmê

HLS:Högskolan För Lärarutbildning i Stockholm.

## JI NAV WEŞANAN

### KURDÊN ÊZDÎ

1-L1 Elmanya Federal pirtûkeke nû l1 ser kurdên Ezdi hat weşandin. Pirtûk j1 aliyê niviskarê Elman Robin Schneider hatiye nîvisandin. D1 nav rûpelên pirtûkê da wusan j1 gelek sûretên ciwan cih girtine. Pirtûk 157 rûpele. Navê pirtûkê b1 Elmani "Die Kurdischen Yezidi" ye.

### JAN

3-Helbestvanê kurd Orhan Kotan b1 navê "SANCI" pirtûkeke helbestan da weşandin. Lê pirtûk l1 ser êş û janên kurdan b1 firehi dîsekine.

### EVÎNA ŞIVAN

5-L1 ser dengbêj Şivan l1 Swêdê j1 aliyê Mahmut Baksi da pirtûkeke nûh hat weşandin. Pirtûk b1 zîmanê Tırki hatiye nîvisandin û navê wê "Şivan'ın Sevdası" ye. Mahmut Baksi d1 vê pirtûkê da l1 ser hunera Şivan dîsekine.

### KURDÊN LI SWÊDÊ

7-B1 navê "Rapport från Seminariet-Kurder i Sverige" b1 vî navê vâ weşaneke nûh b1 zîmanê Swêdi derket. D1 nav rûpelên pirtûkê da gelek bend l1 ser dirok, çand, zîmanê û rewşa kurdên l1 Swêd dijin hene. Pirtûk j1 aliyê "Sazgeha Bîyaniyan" da hatiye amadekirin.

### HELBESTÊN CIGERXWÎN

2-Çend helbestên Cigerxwin b1 zîmanê Îngilizi l1 Awustralyê hatin çapkirin. Şahin Bekir hemû ev helbestana wergerandine b1 zîmanê Îngilizi. D1 nav vê berevokê da 12 helbestên Cigerxwin cih girtine.

### DENGÊ XÊZIKAN

4-Wênevanê kurd Mamoste b1 navê "Dengê Xêzikan" pirtûkeke xetan-xêzikan l1 Swêdê amade kir û ev pirtûk d1 nav weşanên "Jina Nû" da hat weşandin. Wusan j1 pêşgotîneke kurdi û Swêdi l1 ser van karên Mamoste d1 pirtûkê da cih girtiye.

### KURD

6-L1 Awustralyê l1 ser kurdan pirtûkek j1 aliyê Peter Kintominas da hat weşandin "The Kurds". Pirtûk d1 nav weşanên Universita bajarê Sydney da derketiye. D1 pirtûkê da kurd tên nasin.

### EM DIXWAZIN AZAD BIN Û KURD BIMININ

8-Pirtûkeke İsmail Beşikçi l1 Elmanya Federal "Em dixwazin Azad bin û Kurd bîminin" (Wir Wollen Frei Und Kurden Sein) b1 zîmanê Elmani hat çapkirin.

### KURD

9-L1 Moskovayê b1 çaveki gişti l1 ser rewşa kurdan, niviskarê Gurci A.M. Menteşasvili lêgerinek amadekir û da weşandin. Çawa tê zanin, A.M. Menteşasvili l1 ser diroka kurdan wek zaneki tê hesabandin.



"L1 Zozanan" — Siyabend